

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

Ola Êzîdîtî

Ola Kurdan ya herî Kevin, Êzîdîtî, li Rûsiya, li gorî daxuyana serokê komîteya Ol û Terîqeyan, Alexander Dvorkin weke Oleke fermî tê pejrandin. Hêvî ew e ku li hemî welatan Ol û netew werin pejrandin.



Fastîvala Helbestê ya Kolompiya

Li bajarê Medelin, li Kolompiya, festivala cihanî, bi beşdariya 70ê helbestvanî li dar ket.ji nav wan helbestvanan, yekem car e ku helbestvanekî Kurd birêz Husên Hebeş – ji Kurdên - Sûriyê- beşdar dibe .Li ser festîvalaê birêz



Husên Hebeş weha dibêje: " Bi kurtî, karê ew pê radibin karekî bi rûmet û cihê serbilindiyê ye...

Tiştê herî balkêş di festîvalê de ew bû ku bi hezaran kes dihatin ji bo helbestê, û ji bo guhdarkirina hastên helbestvanan... Gava me dixwend millet bi dil, giyan, guh, çav û bi hemû hastên xwe guhdarî me dikirn. Bi rastî tiştêkî ne normal bû

. Di festivalê de, ez weke helbestvanekî Kurd ji sûriyê hatim pêşkêşkirin."

Dumahîk : Turkiye..

Lê, divê bête zanîn ku, bona çareserkirina pirsê gelê Kurd, ji riya aştiyane pêve, tu rê yên dî nînin. Lewre jî şeweyên demokratîk û şaristanî di danûstandin, gotbêj û diyalogan de bona naskirin û rêzgirtina maf û berjewendiyên hemiyar, doz û daxwaza herî pêwîst, zor girîng û dîrokî ye, ji ber ku , li cî ye û hew.

Sînorê Yekta

15 Ê Gulana 2009 an

Birûsk

Ji Komîta Şevbuhêrkên Kurdî

li Şamê re

Xwîşk û birayên hêja... Beşdarên birêz...

Bi bûneya 6 saliya damezrandina Komîta we, **Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê**, bi navê weşana NEWROZê, em we pîroz dikin, û hêviya berdewamî û serkeftinê ji karê we re dikin.

Hêvî û dilxwaziya me ew e ku em hemî bi hev re ji bo geşkirina zimanê kurdî di civakê de kar û xebatê bikin û evîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dê, zimanê me yê kurdî belav bikin.



Bêgomne ku çalakî û xebatên we yên pîroz di warê lidarxistina şevbuhêrkên Kurdî de cihê dilşadî û şanaziya me ye, û bi dilgermî em karê we destek dikin.

Careke din em we pîroz dikin, hêvîdar in ku xebata we ya ji bo zimanê Kurdî her berdewam be.

Weşana NEWROZ

31.07.2009Z-2621 K

Abeya zimanê Kurdî

Abeyên zimanê Kurdî(alfêba) yên ku di nav gelê Kurd de li Sûriyê belavkirî , û ji bo fêrkirinê tene bikaranîn gelek in . Lê , li gor çavdêriya mamostên zimanê Kurdî gelek kêmkasî di wan de tene dîtin .

Ji ber wan têbînan , mamoste Merwan Berekat bi hevpişkiya mamoste Memê Alan û bi alîkariya pêşinyarên hêja yên gelek mamosteyên mîna Pertewê Şerqî , Apê Osnebir û bavê Ciwan , Abeyeke zimanê kurdî , rengîn , lihevhatî , bi Kurdiyeke xwerû , hevokên xweşpîvayî , bi erêkirina wazeta ragiyandinê , çapkir û belav kir.

Cara yekê ye , ku berhemeke ferkirinê bi ked û cefakî komelîn ên gelek mamostên zimanê kurdî , û di gel sudegirtina ji gelek abeyên di nav lepan de , çî yên kurdî û çî jî yên biyanî , derdikeve û jiyanê dibîne .

Hêvî û armanç ji vî karî , ku ev abeya nû , pir belav bibe , di gelek malên Kurdan de cî bigre , û komît û saziyên zimanê kurdî bi wê zarok û mendal û nûhtiyên zimên fêr bikin .